



AYRIMCILIĞA KARŞI

LI HEMBERÎ CİHÊKARÎYÊ RÊBAZÊN SERLÊDANÊ



TOHAV
Toplum ve Hukuk Araştırmaları Vakfı
Foundation for Society and Legal Studies



Ev proje bi piştgirîya Yekîtiya Ewropayê ve tê birêvebirin.



MAFÊN ME Û CIHÊKARÎ/CIYÊWAZÎ

Ji ber ku em mirov in, gelek mafên me hene. Jiyîn, vegotina nêrînên me, perwerdehiyeke baş, sitara xaniyekî ku em bikarin tê de bijîn, nedîtina îşkenceyê, karekî ku em tê de bixebitin, îbadetên li gorî bawerîya me, axaftin û nivîsandina zimanê me yê zikmakî, darizandineke heqanî û gelek mafên din ji hin mafên me yên mirovan in.

Mafên mirovan li her deverê cihanê derbasdar in, her mirov xwediyê van mafan e. Kî be bila be tu kes nikare van mafan ji holê rake an jî binpê bike. Peywira hemû dewletan a herî bingeîn; qebûlkirin û parastina van mafan e. Her wiha her dewlet divê rê li ber hemû mirovan veke ku bi rehetî bikarin wan mafên xwe bi kar bînin.

Dî qadên navneteweyî de, di bin banê Neteweyên Yekbûyî (NY) û Konseya Ewropayê de gelek peymanên mafên mirovan hatine destnîşankirin. Hemû dewlet jî divê di bin banê makeqanûnên xwe de van mafan biparêzin, ji bo vê divê sazîyan ava bikin. Her wiha jî bo parastina van mafan di qada navneteweyî de dezgêyên cûr bi cûr hene.

Cihêkarî ew tişt e ku; wek nimûne dema ku ji ber zayenda we, ji ber zimanê ku hûn pê diaxivin, ji ber ol û bawerîya we an jî ji ber taybetmendîyeke we ya din hûn nikaribin hin mafên xwe yên mirovan bi kar bînin an jî di bikaranîna van mafên xwe de hûn ji ber van sedeman ji mirovên din cudatir bînin hesabandin û ji we re astengî bînin derxistin ew tê wê wateyê ku cihêkarî/ciyêwazî derketiyê holê.

Li gorî peymanên mafên mirovan heke şert û mercên kesekî/ê ne wek ên din be, divê dewlet bi taybetî bi wî/wê kesî/ê re eleqedar bibe. Piştgirîya bo van kesan peywireke sereke ya dewletan e. Peymanên mafên mirovan; cihêkarîya ku di navbera mirovan de ji ber nijad, reng, ziman, zayend, nasnameya zayendî, temen, astengdarî, nêrînên siyasî, eslê nijadî û neteweyî, malhebûnî û her wekî din ji ber sedemeke din derkeve holê qedexe dikin. Bi saya van peymanan di navbera mirovan de kiryarên cihêkar tînin astengkirin.

Peymanên Ku Me Ji Cihêkarîyê Diparêzin Çi Ne?

Li gorî Peymana Navneteweyî ya Mafê Mirovan a ku di sala 1948an de hatiye qebûl kirin, di benda wê ya Zyemîn de cihêkarî hatiye qedexekirin û li gorî vê xalê her kes bi heman şiklî xwedîyê van mafan e. Cihêkarî di hemû peymanên mafê mirovan de hatiye qedexekirin. Her wiha ji bo kesên ku bi rêk û pêk bi cihêkarîyê re rû bi rû dimînin ji bêne parastin, peymanên taybet wek Peymana Astengkirina Hemû Cihêkarîyan a Li Hemberî Jinan hatine amadekirin.

Tirkîyeyê ev peyman qebûl kirine û dewlet, ji bo hemû kesên ku li Tirkîyeyê dijin bo ku ji mafê mirovan bi heman şiklî sûd wergirin, divê şert û mercên guncan ava bike. Peymanên din ên ku cihêkarî tê hatine qedexekirin ev in;

- Peymana Mafê Mirovan a Ewropayê
- Peymana Navneteweyî ya Rêlibergirtina Her Cihêkarîya Ku ji ber Nijadê Derdikeve Holê
- Peymana Navneteweyî ya Bo Mafên Medenî û Polîtîk
- Peymana Navneteweyî ya ku li ser Mafên Aborî, Civakî û Çandî
- Peymana Astengkirina Hemû Cihêkarîyên Li Hemberî Jinan
- Peymana Navneteweyî ya Rêlibergirtina Îşkenceyê, Kîryarên Zalimî, Tevgerên ku Rûmeta Mirovan Dişkînin û Cezayên bi vî Şiklî.
- Peymana Parastina Mafên Zarokan
- Peymana Mafên Karkerên Penaber û Malbatên Wan
- Peymana Di Der Barê Mafên Astengdaran De

Peymana Mafê Mirovan a Navneteweyî

'Xal 2 – Her kes bêyî ku li nijad, reng, zayend, ziman, ol, nêrînen siyasî an jî nêrîneke din, eslê civakî an jî nijadî, malhebûnî, zayîn an jî li taybetmendîyêke din bê nihêrtin bêcudahi dikare ji maf û azadîyên ku di vê Peymanê de hatine destnîşankirin sûdê wergire. Her wiha kesek çî serbixwe be çî di bin wesayetekê de be, çî hemwelatîyê dewleteke ku di bin hikmê dewleteke din de be û çî jî hemwelatîyê dewleteke ku hikmê wê hatiye sinordarkirin de be jî bêyî ku li van bê nihêrtin di der barê bikaranînen mafên wî /wê kesî de ji ber ku hemwelatîyê welatekî wiha ye, bêyî ku li statuya hiqûqî û ya navneteweyî ya wî welatî bê nihêrtin de tu cudahî neyê kirin.

Di Hiqûqa Tirkîyeyê de Em Ji Cihêkarîyê Çawa Tê Parastin?

Di hiqûqa navxweyî ya Tirkîyeyê de her kes xwedî mafên hevpar e û tu kes divê neyê cihêkirin. Ev yek di makeqanûn û qanûnên din de hatiye parastin.

- Makeqanûn (Xal 10)
- Qanûna Cezayî ya Tirkan (Xal 122)
- Qanûna Karî (Xal 5)
- Qanûna Di Der Barê Astengdaran De (Xal 4/A)
- Qanûna Sazîya Mafê Mirovan û Wekhevîyê ya Tirkîyeyê
- Qanûna Bingehîn a Perwerdehiya Netewî (Xal 4 û 8)
- Qanûna Karmendên Dewletê (Xal 7)

Di hiqûqa navxweyî de li gel qanûnên bingehîn di gerîndetîyên cur bi cur de jî cihêkarî hatiye qedexekirin û di van gerîndetîyan de hikmên ku li hemberî cihêkarîyê radibin cih digirin.

Hûn Van Dizanin?

Hemû dewlet; bêyî ku li nijad, reng, zayend, ziman, bawerî, eslê we, malhebûna we, jî dayik bûn, nêrînen siyasî û statûya we binêre, divê bêcudahi hemû mafan ji bo hemû kesan temîn bike û ji van mafan re rêz bigire. Ev yek peywireke sereke ya dewletan e.

Cureyên Cihêkariyê

Di belgeyên Mafên Mirovan ên Navneteweyî û di hiqûqa navxweyî de li ser cihêkariyê hin ravekirin ji cih digirin. Cihêkariyên ku hatine pênasakirin;

► Cihêkariya Rasterast

Wek nimûne; dema ku hûn bixwazin xaniyekî kirê bikin an ji ber nijada we an jî ji ber zayenda we xanî bi we nedin kirêkirin, hûn bi cihêkariyê rasterast re rû bi rû mane.

► Cihêkariya Nerasterast

Wek nimûne; Heke hûn ji ber baweriyên xwe yê olî nexwazin leşkeriya mecbûrî bikin û ji ber vê yekê hûn werin darizandin.

► Cihêkariya Têkildar

Wek nimûne; ji ber nijad û bawerîya hevsera/ê xwe heke hûn bi cihêkariyê re rû bi rû bimînin an jî ji ber doza zaroka/ê xwe dest dêynin li ser hesabên we yê bankayê.

► Cihêkariya Pirhejmar

Wek nimûne; heke hem astengîyê we hebe û hem jî hûn jin bin û ji ber van taybetmendiyên xwe hûn nikaribin li cihê karî derbasî mertebeyê bilindtir bibin.

► Dest Dirêji/Taciz

Wek nimûne; ji ber baweriyên we yê olî mala we an jî cihê we yê karî were deqsozîkirin.

► Mexdûrkirin

Wek nimûne; heke hûn di dibistanê de ji hêla mamosteyekê/ekî ve werin cihêkirin û gava ku hûn rêveberîya dibistanê agahdar bikin di ser de hûn cezaya disîplînê bistînin.

Ez bi Bûyereke Cihêkar Re Rû bi Rû Mam Divê Ez Çi Bikim?

Heger hûn difikirin ku di bikaranîna mafekî ji mafên we de ji ber zayenda we, netewa we, zimanê we, ola we, bawerîya we, mezheba we, dîtînen we yê felsefî û polîtîk, nijada we, malhebûna we, rewşa we ya medenî, rewşa we ya tendiristiyê, astengiyên we, temenê we û her wekî din ji ber taybetmendiyê we ya din pirsgirêkek derketiye û ji ber vê taybetmendiyê we, we nekariye wî mafê xwe bi kar binin û we miameleyê cuda dîtibe û ev yek êdî bûbe kiryareke cihêkar û ciyêwaz divê di serî de;

- Cihê ku bûyer lê qewimîye, dîrok, agahiyên saziya taybet an jî ya dewletê,
- Kesê/a an jî kesên ku kiryareke cihêkar pêk anîye peywira wan çî ye û heke pêkan be navên wan çî ye, wan agahîyan qeyd bikin li gel xwe.
- Heke belgeyên we yê nivîskî hebin wan veşêrin. (Wek nivîsên fermî, raporên bijîşkan)
- Heke kesek an jî hin kes şahidê wê bûyerê bin navên wan û agahiyên wan ên pêwendiyê wergirin.
- Heke şahid hebin ji wan bixwazin ku bo we şahidiyê bikin.
- Heke di der barê bûyerê de wêne, vîdyo û delîlên din hebin wan veşêrin.

Ji bîr nekin; dema ku hûn bi bûyereke cihêkar re rû bi rû bimînin di qadên navxweyî û di qadên navneteweyî de mekanîzmayên ku hûn ê bikarin doza mafê xwe bikin hene. Her wiha ji bîr nekin ku dema hûn bixwazin serî li van mekanîzmayan bidin û doza mafê xwe ji wan bikin hûn dikarin serî li me jî bidin. Em ê ji li ser vê serlêdana we alîkarî û piştgirîya hiqûqî bidin we.

Hûn Dikarin Serî Li Me Bidin.

www.ayrimciligakarsi.org
info@ayrimciligakarsi.org
+90 (533) 658 76 14

Dev ji doza mafê xwe bernedin; Dema ku hûn ji bo bûyereke cihêkar serî li mekanîzmayên ku ji bo wî tiştî hatine avakirin bidin ev yek dê bibe sedem ku mirovên din ji bi bûyerên cihêkar re rû bi rû nemînin.

Mekanîzmayên Navxweyî Yê ku Hûn Dikarin Serî Lê Bidin

► Hûn Dikarin Serî li Saziya Mafê Mirovan û Wekhevîyê ya Tirkîyê Bidin.

- Hûn dikarin ji bo kiryara cihêkar a ku hatiye serê we bi dest, bi rêya postayê an jî bi awayekî onlîne serî lê bidin. Lê belê heke hûn bi awayekî onlîne serî lê bidin divê di nav 15 rojan de hûn serlêdana xwe ji saziyê re bi rêya postayê jî bişînin.
- Di dema serlêdanê de hûn dikarin daxwaz bikin ku nasnameya we neyê aşkerakirin.
- Hûn dikarin bi destê nûnerê xwe yê qanûnî an jî bi destê parêzerê/a xwe jî serî lê bidin.
- Ji bo ku hûn bikarin serî lê bidin ne şert e ku hûn hemwelatîyê Tirkîyê bin.
- Hûn dikarin ji bilî Tirkî bi zimanekî din jî serî lê bidin. Lê belê dê Sazî nixandinekê bo vê yekê bike û heke bîryarê bide ku di vê serlêdana we de sedemeke we ya mafdar û aqilane heye dê bipejirîne.
- Di dema serlêdanê de pêwîst nake ku hûn destheqekî lê bidin.
- Ji girtîgehan û ji Navendên Paşveşandinê jî hûn dikarin serî lê bidin.
- Her wiha bi rêya Parêzgerî û Qeymeqamtîyan ve jî hûn dikarin serî li Saziya Mafê Mirovan û Wekhevîyê ya Tirkîyê bidin.

Agahiyên Pêwendiyê yê Saziya Mafê Mirovan û Wekhevîyê ya Tirkîyê

Malper	: http://tihek.gov.tr
E-mail	: baskanlik@tihek.gov.tr
Agahiya Serlêdanê	: esitlik@tihek.gov.tr
Navnişan	: Kolana Yükselê. No:23 06650, Kizilay/ENQERE

► Hûn Dikarin Serî li Saziya Pişkînerîya Raya Giştî /Ombudsmantîyê Bidin.

- Di der barê bûyera cihêkar a ku hatiye serê we hûn dikarin bi awayekî onlîne li ser serlêdana online, li ser e-dewletê, li ser e-mailê an jî rasterast bi dest serî lê bidin. Lê belê heke hûn bi awayekî onlîne serî lê bidin divê di nav 15 rojan de hûn serlêdana xwe bi rêya postayê bişînin saziyê.
- Di dema serlêdanê de hûn dikarin daxwaz bikin ku nasnameya we neyê aşkerakirin.
- Hûn dikarin bi destê nûnerê xwe yê qanûnî an jî bi destê parêzerê/a xwe jî serî lê bidin.
- Ji bo ku hûn bikarin serî lê bidin ne şert e ku hûn hemwelatîyê Tirkîyê bin.
- Di dema serlêdanê de pêwîst nake ku hûn destheqekî lê bidin.
- Bi rêya Parêzgerî û Qeymeqamtîyan ve jî hûn dikarin serî lê bidin.
- Heke astengîyeke we ya taybet hebe û hûn vê aşkera bikin Sazî neçar e ku ji bo vê yekê bergiriyên pêwîst pêk bîne.
- Hûn dikarin ji bo binpêkirina mafê zarokê serî lê bidin. Ji bo vê yekê şerta berjewendiyê pêwîst nake.
- Heke hûn zarok bin (Ango ji 18 salîyê xwe biçûktir bin) hûn dikarin li ser vê malperê(www.kdkcocuk.gov.tr) serî lê bidin.

Agahiyên Pêwendiyê yê Saziya Pişkînerîya Raya Giştî

Tel	: +90 312 465 22 00,
Faks	: +90 312 465 22 65
Malper	: https://www.ombudsman.gov.tr
E-mail	: iletisim@ombudsman.gov.tr
Navnişan	: Saziya Pişkînerîya Raya Giştî ya Komara Tirkîyê [Navend]: Taxa Kavaklidereyê Kolana Nevzat Tandoğanî. No:4 Çankaya/ENQERE

Şaxa Stenbolê

Tel : +90 212 346 33 84-85,
Faks : +90 212 346 33 86
Navnişan : Taxa Halaskargaziyê Sikaka Matbaci Osmanbey No: 46/B Şişli/STENBOL



► Hûn Dikarin Serî li Dozgeriyên Komarî Bidin û Der Barê Rewşa Xwe De Qeyda Sûcê Bidin Wergirtin û Her Wiha Hûn Dikarin bi Rêya Dadgehan Dozan jî Vekin.

- Heke hûn bi bûyereke cihêkar re rû bi rû bimînin, hûn dikarin ji bo vê yekê serî li Dozgeriya Komarê ya ku herî nêzî we ye bidin.
- Ji ber ku hem di dozgeriyan de hem jî di dadgehan de hûrgiliyên serilêdanê pir zêde ne em wisa pêşniyar dikin ku hûn ji parêzereki/ê piştgiriyê bixwazin dê gelek baş bibe.
- Heke rewşa we ya aborî ji bo girtina parêzereki/ê têr neke hûn dikarin ji Baroya bajarê ku hûn lê ne alîkariyê bixwazin û serî li navenda wan a alîkariya adlî bidin.

► Hûn Dikarin bi Awayekî Şexsî Serî li Dadgeha Qanûna Bingehîn Bidin.

- Ji bo ku hûn bikarin bo bûyereke cihêkar serî li Dadgeha Qanûna Bingehîn bidin divê di serî de hemû astên din yên hiqûqî biqedin ango serlêdana vê derê rêya herî dawî ya hiqûqa navxweyî ye.
- Ji bo ku hûn bikarin wek şexs serî li vê dadgehê bidin, divê piştî bîryar dadgeha herî dawî di nav 30 rojî de hûn serî lê bidin.
- Forma serlêdana şexsî û pêvekên wê; rasterast hûn dikarin ji dadgehê ji dest wergirin an jî bi rêya dadgehên nobedar û nûnertiyan derveyî welêt jî hûn dikarin bi dest bixin.
- Hûn dikarin di serilêdanê de ji wan bixwazin ku ew nasnameya we veşêrin ango di pêvajoya hiqûqî de navê we li gorî daxwaza we dikare neyê aşkerakirin.
- Di girtîgehan de bi rêya rêveberiya girtîgehê ve hûn dikarin serî lê bidin.
- Hûn dikarin bi tena serê xwe bêtî ku hûn ji parêzereki/ê alîkarî bixwazin jî serî li vê dadgehê bidin.
- Dema ku we serî li Dadgeha Qanûna Bingehîn da divê hûn xerca ku hatiye diyarkirin bidin lê heke rewşa we ya aborî bo vê yekê têr neke hûn dikarin ji wan daxwaz bikin û beyî ku hûn xercê razînin jî bi rêya alîkariya adlî hûn dikarin serî lê bidin.

Agahiyên Pêwendiyê yên Dadgeha Qanûna Bingehîn

Malpera Fermî : <http://www.anayasa.gov.tr>

Tel : +90 312 463 73 00,

E-mail : bilgi@anayasa.gov.tr

Navnişan : Taxa Ahlatlibelê, Bulvara Încek Şehit Savci Mehmet Selîm Kîraz No: 4 PK: 06805
Çankaya / ENQERE

Ez Çawa Dikarim Daxwaza Alîkarîya Adlî Bikim?

Heger rewşa we ya aborî ji bo girtina parêzerekê/î têr neke û rewşa ku hûn tê de ne heke bo serîlêdana alîkarîya adlî ji astengdar be, wê demê hûn dikarin rasterast serî li me bidin.

Hûn Dikarin Serî Li Me Bidin.
www.ayrimciligakarsi.org
info@ayrimciligakarsi.org
+90 (533) 658 76 14

Ji bo ku her şexs bi rehetî bikare bigihîje mafên xwe yê heq û rewşa û her wiha ji bo pêgihîştina lêgerîna heqên wan hêsantir û xurttir bibe di mewzûatê de bi du rêyan alîkarîya adlî hatiye birêxistin.

► Ji Baroyan Daxwaza Alîkarîya Adlî

Heke rewşa we ya aborî ji bo girtina parêzerekî/ê têr neke wê demê hûn dikarin ji Baroya bajarê ku hûn lê ne daxwaza Alîkarîya Adlî bikin. Piştgirîya ku ji hêla Baroyan ve bê dayîn bes bi xizmeta parêzertiyê ve sinordar e. Lêçûnên Darizandinê (xercên dadgehane, lêçûnên kesên pispor û hwd.) di nav wê piştgiriyê de cih nagirin.

Ji bo ku Hûn Bikarin Ji Baroyan Piştgirîya Adlî Wergirin Kîjan Belge Pêwîst in?

- Ji Keyatîya taxê belgeya danîşgehê û belgeya rewşa aborî
- Fotokopîya Nasnameyê
- Fotokopiyên Belgeyên ku ji bo Dozê Pêwîst in.

► Bi Bîryara Dadgehê Alîkarîya Adlî

Piştgirîya ku bi rêya Dadgehane ji bo alîkarîya adlî bê dayîn ji piştgirîya alîkarîya adlî ya Baroyan cudatir e û xwe dispêrîne Zagona Daraziyên Hiqûqî(ZMH). Di nav vê zagonê de di xala 334an de û di xala 340î de di der barê alîkarîya adlî de tiştên pêwîst û xisûsên bingehîn hatine destnîşankirin.

Di Nav Çarçoveya Zagona Darazî ya Cezayî (ZDC) De Piştgiriyên Hiqûqî yê ku Hûn Dikarin Wergirin

- Heke di dozê de hûn bi awayekî gumanbar an jî sûcdar bînin darizandin û di dozê de hûn diyar bikin ku ji ber rewşa xwe ya aborî hûn nikarin parêzerekî/ê bigirin wê demê li ser daxwaza we dê parêzerekê bê peywardarkirin ji bo doza we.
- Heke hûn zarok, ker, lal an jî ji ber rewşeke astengdar hûn nikarin xwe biparêzin wê demê pêwîst nake ku hûn daxwaza parêzerê jî bikin, jixweber dê parêzerekê bo we bê peywardarkirin.
- Heke di der barê we de dozê ku sinorê wê yê cezayê girtîgehê jî 5 salan zêdetir be hebe jî hem di asta lêpîrsinê hem jî di asta darizandinê de beyî ku hûn daxwaz bikin dê ji bo doza we parêzerekê bê peywardarkirin. Ev parêzer di hemû astên darizandina we de dê cih bigire.

Rewşên ku Divê Teqez Wergêr(Mitercim) Hebe

- Heke bi qasî ku hûn bikarin xwe îfade bikin û rewşa xwe bînin ziman tirkî nizanibin an jî hûn ker bin; dê ji hêla dozgeriyê an jî dadgehê ve bo we wergêrê bê peywardarkirin. Dema ku hûn xwe îfade bikin dê hemû axaftinên we ji hêla wî/wê wergêrî/ê ve bînin wergerandin.
- Heke rewşeke we ya astengdar hebe; di danîşinê de hem di der barê angaştan de hem jî di der barê parastinan de xalên herî girîng divê bi awayekî ku hûn ê jê fêhm bikin ji we re werin vegotin.

Sazî û Dezgehên Navneteweyî yên ku Hûn Dikarin Serî Lê Bidin

Heke hûn bixwazin bûyera cihêkar a ku hatiye serê we bigihînin sazî û dezgehên navneteweyî, hûn dikarin serî li me bidin.

Hûn Dikarin Serî Li Me Bidin.
www.ayrimciligakarsi.org
info@ayrimciligakarsi.org
+90 [533] 658 76 14

Ji bo ku hûn bikaribin bo bûyera cihêkar a ku hatiye serê we serî li sazî û dezgehên navneteweyî bidin divê di serî de hûn hemû rêyên hiqûqî yên navxweyî bi dawî bikin. Bidawîkirina rêyên hiqûqî jî ew tişt e ku li gorî Zagonên Tirkiyê divê dadgeha an jî saziyê hiqûqî nemîne ku hûn bikarin serî lê bidin. Piştî ku we serî li hemû dadgehên navxweyî da şûn ve hûn dikarin serî li saziyên navneteweyî bidin. Ango bidawîbûna rêyên hiqûqî yên navxweyî;

- Di der barê dosyaya we de dema ku bîyara neşopandinê bê dayîn
- Dema ku serlêdanên we bîr redkirin. (Di encama Dadgeha Jorîn De)
- Dema ku delîlên der barê dosyaya we de li dosyaya we neyên zêdekirin.
- Dema ku îtirazên we bîr paşguhkirin. (Di encama Dadgeha Jorîn De)
- Dema ku hûn wek dîl bîr darizandin û ji bo vê dîlgirtinê hûn îtiraz bikin û ev îtiraz bîr redkirin. Di rewşên wiha de êdî rêyên hiqûqî yên navxweyî bi dawî dibin.

- Serlêdana Şexsî ji bo Komîteya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî(NY)
- Gilikirin ji bo Konseya Mafê Mirovan a Neteweyên Yekbûyî(NY)
- Serlêdana Şexsî ji bo Komîteya Mafên Astengdaran a Neteweyên Yekbûyî(NY)
- Serlêdana Şexsî ji bo Komîteya Rêlibergirtina Cihêkariya Li Ser Jinan a Neteweyên Yekbûyî(NY)
- Serlêdana Şexsî ji bo Komîteya Rêlibergirtina Îşkenceyê

Serlêdana Şexsî ji bo Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê

- Heke hûn bi bûyereke cihêkar re rû bi rû bîminin û we serî li hemû rêyên hiqûqî yên navxweyî dabe û bîyara dawî bi encam bûbe; piştî ku bîyara dawî teqez bû şûn ve di nav 6 mehan de hûn dikarin dosyaya xwe bibin Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê. Heke di nav 6 mehan de hûn serî lê nedin ji hêla Dadgehê ve dibe ku serlêdana we neyê pejirandin.
- Heke di der barê bînpêkirina mafên we de rêyêke hiqûqî di nav hiqûqa navxweyî de nehatibe destnîşankirin an jî ev rê bêkêr be wê demê ji hêla dadgehê ve zagona 6 mehan nayê bikaranîn. Ango wê demê hewce nake ku hûn di nav 6 mehan de serî lê bidin.
- Ji bo serlêdanê hewce nake ku hûn xerçeke serlêdanê razînin. Ango bo serlêdanê dê ji we pere neyê xwestin.
- Divê hûn forma serlêdanê ya ku di malpera Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê de ye (<https://www.echr.coe.int/Pages/home.aspx?p=applicants/tur&c=>) bê kêmasî û bê çewtî tije bikin. Dema ku we forma serlêdanê tije kir şûn ve jî belgeyên ku dê serlêdana we xurttir bike divê hûn kopyayêke wan jî di nav dosyaya xwe de bi cih bikin.
- Hûn serlêdana xwe tenê dikarin bi rêya postayê bişînin navnişana ku li jêr hatiye dayîn. Ji bilî vê rêyê rêyêke din tune ye ku hûn dosyaya xwe bişînin.

Navnişan: The Registrar European Court of Human Rights Council of Europe F-67075
Strasbourg cedex France

- Hûn dikarin dosyaya serlêdana xwe bi tirkî jî amade bikin. Lê belê heke hûn bikarin bi zimanên fermî yên Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê (Ango Îngilîzî û Fransî) amade bikin wê demê encamkirina dosyaya we dê zûtir pêk were.

- Dema ku hûn serlêdanekê şexsî bikin ne şert e ku hûn ji hêla parêzerekê/î ve bîn temsilkirin. Lê belê heke hûn bikarin ji parêzerekê/ê piştgirîya profesyonel a hiqûqî wergirin dê pêvajoya serlêdana we baştir bi rê ve biçê.

Heke hûn bixwazin bûyera cihêkar a ku hatiye serê we bibin Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê hûn dikarin bi rêya van navnîşanên ku li jêr hatine dayîn bi me re bikevin têkiliyê û piştgirîya profesyonel a parêzertiyê ji me bixwazin.
www.ayrimciligakarsi.org
info@ayrimciligakarsi.org
+90 (533) 658 76 14

DI DER BARÊ PROJYÊ DE

Projeya Ji Bo Xurtkirina Mekanîzmayên Serlêdanên Li Hemberî Kiryarên Cihêkar di nav çarçoveya Bernameya Bexşê ya Weqfa Hrant Dinkê ya ku ji bo Geşkirin û Xurtkirina Qada Sîvil hatiye destnîşankirin, ji hêla Weqfa Civakî û Lêkolînên Hiqûqî û ji hêla Komeleya Çavdêriyê Ji Bo Mafên Wekhev ve tê birêvebirin.

Her çî qas li Tirkiyê qedexeya kiryarên cihêkar di nav çarçoveya hiqûqî de hatibe pênasekirin û bi zagonên hiqûqî hatibin mîsogerkin ji jî bo ku rê li ber van kiryarên cihêkar bê girtin mekanîzmayên hiqûqî yê navxweyî û yê navneteweyî jî tê de hemû mekanîzmayên hiqûqî kêmtir dimînin. Ji ber vê yekê jî têkoşîna ku li hemberî kiryarên cihêkar tê dayîn û ji bo ku ev bûyer bi giştî bîn qedexekirin lawaziyek derdikeve holê.

Di vê çarçoveyê de jî sazîyên serlêder yê hevpar ji bo piştgiriyê bidin têkoşîna li hemberî kiryarên cihêkar û ji bo ku li hemberî kiryarên cihêkar mekanîzmayên serlêdanan xurttir bibin û her wiha yê heyî jî bi awayekî baş bîn bikaranîn bi sazîyên sîvil re xebatên hevpar dikin, perwerdehiya xwendin û nivîsîna hiqûqî didin û her wiha serlêdanên şexsî ji dipejirînin.

Hûn Dikarin Serî li Weqfa Civakî û Lêkolînên Hiqûqî û Komeleya Çavdêriyê ya Ji Bo Mafên Wekhev bidin.

Dema ku hûn bi bûyereke cihêkar re rû bi rû bimînin an jî mafekî we yê bingehîn bê binpêkirin hûn dikarin bi awayekî şexsî rasterast serî li me bidin. Her wiha pêkan e ku hûn bi rêya e-mail û telefonan jî serî li me bidin. Dema ku we serî li me da şûn ve di serî de em ê piştgirîya hiqûqî bidin we. Her wiha dema ku hûn serî li Ombudsmantiyê, Li Sazîya Mafê Mirovan û Wekhevîyê a Tirkiyê, li Dozgerîyan, li Dadgehan û li Komîteyên Neteweyên Yekbûyî bidin jî em dikarin alîkarî û piştgiriyê bidin we û her wiha dema ku hûn karbidestiyê bidin me em dikarin li ser navê we jî serî li van deran bidin.

Malper : www.ayrimciligakarsi.org
E-mail : info@ayrimciligakarsi.org
Tel : +90 (533) 658 76 14

WEQFA CIVAKÎ Û LÊKOLÎNÊN HIQÛQÎ

Telefon : 0 (212) 293 47 70-71
Faks : 0 (212) 293 47 72
Malper : www.tohav.org
E-mail : tohavbilgi@gmail.com
Navnîşan : Taxa Kuloglu, Sikaka Turnacıbaşıyê
No: 55/57 Kat: 3-4-5 Beyoglu/STENBOL

KOMELEYA ÇAVDÊRÎYÊ JI BO MAFÊN WEKHEV

Telefon : +90 212 293 63 77
Malper : www.esithaklar.org
E-mail : info@esithaklar.org
Navnîşan : Taxa Gümüşsuyu. Sikaka Ağçiragiyê,
Apartmana Pamirê. No:7/1
Beyoglu/STENBOL



Malper: www.ayrimciligakarsi.org
E-mail: info@ayrimciligakarsi.org
Tel: +90 (533) 658 76 14



TOHAV
Toplum ve Hukuk Araştırmaları Vakfı
Foundation for Society and Legal Studies



Ev belavok di çarçoveya Bernameya Bexşê ya Weqfa Hrant Dinkê de bi piştgiriya Yekîtiya Ewropayê ve hatiye amadekirin. Berpirsiyariya naveroka vê belavokê bi giştî ya Weqfa Civakî û Lêkolînê Hiqûqî ye. Nêrînên Weqfa Hrant Dinkê û nêrînên Yekîtiya Ewropayê nişan nade.